Selman Kovilî

Ew helbestvanê bejna wî bilind mayî

Berhevkirin: Nûbûn

Dibêjin, mirina kesî naniyase û hemû coreyên jiyandaran dikuje û di nav perasiyên axê re berze û vedişêre. Lê mirin çarenivîsê her tiştekê jiyandare û revîn nabe. Şahan dibe, mezinan wenda dike, şareza û aqilmendan di nav tariyê de dipêçe, belê gelek ji van belku bi cesteyê xwe li nav me namînin, lê bi giyanê xwe di nav me de dijîn û zeman bi dirêjî û xweşî û nexweşiyên xwe ve neşê bîrhatina wî ji nav me rake. Yek ji wan stêrên li esmanê kurdîniyê di nav bizava rewşenbîriya wî de mane geşe û birîqedar, helbestvanê mezin kurd Selman Kovilî bûye.

Li sala 1953-ê li gundê Rostînkê li ser parêzgeha Duhokê hatiye dinyayê û di salên 70 an de û bi dirustî li sala 19730-ê dest bi nivîsînê kiriye ji dîwanên wî yên çapkirî: "Werine Evînê" li sala 1988-ê li Hewlêrê çap bûye "Cîhana Guhan" jî li sala1996-ê li Duhokê çapbûye, her wesan piştî wexerkirna vî hozanvanê mezin dîwana "Tîr ji kevana diweşin û ber dihêne min" ji layê Yekitiya Nivîserên Kurd tayê Duhokê ve li sala 2005-ê hatiye çapkirin. "Demê Çargoşe" li sala 1998-ê hatiye çapkirin û "Çîvanokên Pîrheviyanî li sala 1999-ê hatiye çapkirin û "Kêza Tere Ciwan" li sala 2002-ê hatiye çapkirin "Bîrhatên Rojên Reş" li sala 2002-ê çap bûye.

Weku aşkera helbestvan Kovilî bi nivîsana hozana nû navdar bûye û destekê bala di vehandina hozanê de hebûye. Di salên 80 an de, Kovilî ji bilî hozanên xwe core deqekê edebî dinivîsî û belav dikir li jêr navê "birûsî", ev birûsiyên Selman Kovilî hêdî hêdî werar û pêşeftin bi xwe ve didît û li dawiyê jî bûne helbest, hozan û xwandevana guhdarên wî pê aram dibûn.

Ji bilî hozanê, Xwedê jê razî çîrok nivîsîne û hindek ji wan çîrokan belav kirîne, çîroknivîs Celal Mistefa di gotarekê de li dor çîrokên Kovilî dibêje: "Deqê edebî û hunerî bi awayekî giştî nequliyeke li dijî gotara asayî, Kovilî jî wek kesekî yaxî û xeyidî li dijî gotara asayî bû.

Hozanvan Selman Kovilî, ji bilî wek hozanvanekî xwedan şiyan û desthelat, wek rewşenbîr û edîbek, di gelek waran de kar kiriye û di biyavê rojnamevaniyê jî de rolekî berçav hebû.

Helbestvan derbirîneka rasteqîne ji doza gelê xwe kiriye, pirsa mirovayetî, civakê kurdî û rewşa Kurdistanê mêvanên helbesta wî bûn verêja wî ya hozanê di peqînê de bûye û gelek dinivîsî. Lê ji encama nexweşiyeka giran li roja 20/12/2003 wexera dawiyê kiriye.